LFV SH
Landesfeuerwehrverband Schleswig-Holstein

**Herausgeber:**
Landesfeuerwehrverband Schleswig-Holstein
Hopfenstraße 2d
24114 Kiel
www.LFV-SH.de

Verantwortlich: Hauke Erichsen

Alle Rechte der Vervielfältigung und Verbreitung in jeglicher Form vorbehalten. Kein Teil des Werkes darf ohne schriftliche Genehmigung des Landesfeuerwehrverbandes Schleswig-Holstein reproduziert, vervielfältigt, verarbeitet oder verbreitet werden.

Gefördert mit Mitteln des
Z:T Zusammenhalt durch Teilhabe
Gefördert durch: Bundesministerium des Innern
aufgrund eines Beschlusses des Deutschen Bundestages

Kurmandschi · Kurmancî

LFV SH
Landesfeuerwehrverband Schleswig-Holstein



# SAZIYA AGIR KUJIYÊ AGEHDARÎYÊ DIKE ...

Jêdûrkirina Şewitînê û helwesta dirist li hember Agir

Bi mirovan ra ji bo mirovan li welat.


## ŞEWATÊN BIÇÛK BI XWE VEMIRÎNIN

Iê belê tu car xwe di nav xeteriyê de nehêlin!

**Dûman jî wekî agir xetere -lê pir bi leztir e!**









## AGAHDARIYAN BI DEST BIXIN,

- hûnê bi çi awayî bikaribin xwe ji xanî an jî ji cîyê lêmanê bigihînin nerdîwanan, holan, deriyan û derîyên pêwîstîyê!
- têlefona nêzîktir, alarma agahdariya agirkujiyê û ya xaniyê li ku ne!
- têlefona hawarê bi çi awayî tê bi kar anîn!
- temirdank û agirkujên din li ku ne û bi çi awayî tên bi kar anîn!











*ÇI BIKIN DEMA DI ŞEWITE?*

## GER RÊYÊN REVÊ DI BIN DÛMANÊ DE BIN

ber bi cihekê bê dûman de vekişin, derî bigrin û bi cil, kinc an jî betanîyan zixt bikin!

Ji pencereyên vekirî banga alîkariyê bikin!

Tucar bi çavkorî ji penceran hilpenekin!







## BALKEŞÎ LI SER BIKARANÎNA AGIR Û ELEKTRÎKÊ!



Divciê cixarekêş herdem xwelîdankan bikar bînin yên kû ne şew itin; tucar kaxetdanka yan tiştên mîna wan bikar neyinin; Balkêşî qedexeya cixarkêşê bibin!

Agir û çavkaniyên kel û germ tucar bê çavderî nehêlin! Ûtî, aletên germkirinê û aletên elektrîkî û tiştên mîna wan çavkaniyên germa bihêz in û wek agir bive ne.

Aletên elektrîkî tucar ne xeyimînin!

Aletên elektrîkî yên xirabe yan jî ne bi awayekî temligorî hatine tamîr kirin, her weha kabloyên elektrîkî yên dirêjkirinê, agir û xeterên elektrîkî bi xwe re tînin û divê tucar neyên bi kar anîn!

Kabloyên qetkirî yan jî brîzên elektrîkê ku yên zêdetir ceryan lê bar kirî dikarin pir germ bibin û bibin sedema agir û şewatê!



*ÇI BIKIN DEMA DI ŞEWITE?*

*SEWATE BIPAREZIN!*

## PÊŞGOTIN



Detlef Radtke
Serokê Agirkujê Parêzgehan

*Agirkuj parçeyeke giring û bingehîn ya ewlekariyê a berjewendiya civaka welatê me ne. „Bi mirovan ra ji bo mirovan li welat“ diruşma me ye, ku Yekîtiya Agirkujiya Herêmî, ji kîjan neteweyî, kîjan olî dibe bila bibe, eslê wî, rengê wî çi dibe bila bibe, bang li hemû mirovan dike, da ku di bin vê dirûşmê hewl bidin.*

*Di vê broşura agahdariyê da, agahdarî û mînak hatine berhev kirin, ku bingeheke baştir ji bo riya xwe ji agir parastinê pêşkêş dike. Yekîtiya Agirkujiya Herêmî ya Schleswig-Holstein, bi zimanên cuda dixwaze alîkariya wan mêr û jinan bike, ku digel kar û xebatên giştî yên agirkujiyê, her weha ji bo perwedekirina penaberan hewl bidin û di cih da kar û xebatên pêşîlêgirtinê pêk bînin.*

*Hedef, ji despêkê da, pêkanîneke kar û xebateke hevbeş ya pêbawer û ya li ser bingeha û hevdufêmkirineke du alî ye. Em spasiya hemû wan kesan dikin, ku ji bo vê hedefê amade bûn û ji bo şêwirdariyê berpirsiyarî girtin ser milên xwe.*

*Li ser navê Yekîtiya Agirkujiya Herêmî ya Schleswig-Holstein, bi taybetî spas li hevalkar Hauke Erichsen dikim, ku wî vê broşura agahdariyê bi minêkariyê û bi nêrînên xwe geş kir û pêk anî.*

*Detlef Radtke*


## BALKÊŞIYEKE DIN:

Di her pirsgirêkên parastina ji agir de, Saziya Agirkujiya Herêmî bi alîkariya we dike.



## BALKÊŞ BIBIN,

- ku hemû riyên rev û xelasiyê serbest in! Hol û nerdîwan riyên rev û xelasiyê ne! Divê ku ew herdem vekirî bin. Ew ne cihê lêsekinandina tiştane!
- deriyên cihên rev û xelasiyê divê her dem girtî bimînin, da ku agir û dû man belav nebin!
- medxelên xanî, avahîyan û dingava girtî ne mînin, erebe rêyên wan ne girin!
- Temirdank, agirkuj û aletên ewlehiyê xirab û girtî nebin!

## SAZIYA AGIRKUJIYÊ AGAHDAR BIKIN

- li ser reqema têlefona **112**!
- Navê xwe bêjin,
- çi qewimî,
- ku derê qewimî,
- çend kes di nav xeter û talûkê.
- Bersîva pirsên din bidin!
- Têlefonê negrin! Li bendê bin heta ku navend axaftinê biqedîne!





**Ji bo henek an jî laqirdiyan tu car têlefonê saziya agirkujiyê nekin!**

## ARAM BIBIN

**û ku vecinix nebe!**


Kîyê bikeve vecinixê, şansa wî kem dibe ku bê zirer ji nav xeterê derkeve!



## HERIN CIHÊN EWLE

**û cîranan agahdar bikin!**

Bi taybetî harîkarîya wan kesan bikin, yên ku pêtivîyên alîkariyê ne. Berîya hemû kesan zarok û kesên neçar, ji ber ku ew nikarin xwe bi xwe ji xilas bikin.



## *ÇI BIKIN DEMA DI ŞEWITE?*

Ger mumkin be, penceran bigrin!


Pêwîste deriyan bigrin, da ku belavbûna agir û dûmanê kêm bibe!

Bilez mal yan xanî bihêlin!

Ji ber xetera fatisînê tucar esensoran (rapark) bi kar neyînin. Ger elektrîk vemire, esensor jî wê asê bibin!

Hemû warvanên xaniyê li ber deriyê avahiyê berhev bibin û li benda agirkujan bimînin!

Xwe ji bo pirsyarên agirkujan yan jî yên polîsan amade bikin!

## *ÇI BIKIN DEMA DI ŞEWITE?*

## *ÇI BIKIN DEMA DI ŞEWITE?*